**Cengê ’hidûs**

Sa’eta min dî sîyeh her têt û rit rengê ’hidûs
Pir rewac û qudre ev jingar û ev pengê ’hidûs

Bê mirwetî têdibin wek Rûstem û efrasîyab
Nasizayî namûwafiq geşte xerçengê ’hidûs

Ser bi ser Nûrî ji bû her nakesan hêla û hat
Çû serê kûhî û temaşa kir li wê cengê ’hidûs

---

**Rewac: birew, pê hezkirdin be şitêk.**
**Peng: ava li cihê xwe mayî.**
**Efrasîyab: kesek bû kû dûjminê Rûstemê Zal bû.**
**Nasiza: gûtinên ne baş, qisey naşirîn, qisey xirab û tin.**
**Nakes: kesî xirab.**
**Kûh: şax, çiya, çêw.**
**Ceng: şer.**

**Rind û ’henes**

Cenge ya ’xew’xaye ev, semmar pir sukund û ’henes
Ba’xê gul nesrîne ’zahir ba’tinî leb qend û ’henes

Carînan we’i’zê mu’seffa dit, qerînê Mû’s’tefa
Carînan yêkser {dirû’xî mî dihed} der bend û ’henes

Min di b’esê vê dinê pirsek ji me’ibûdî dikir
Emir hat dinya ke hê şahid nema, gû fend û ’henes

Gahê desmî û gaserî me’hbûbe ya berqa gulah
Reng bi ser nûra ezel bê nûre pir xirsend û ’henes

Ez di ba’xê we’hdetê geryamî min dî lê fe’za
Yêk li wê mîrek dinê her we’sfekê manend û ’henes

Nûrîya kes dî ji bil min qet nizanît heyietê
Ev dinê pir nûr û ’zulmet dilberek dî rind û ’henes

---

**Qerîn: nizîk, nêzîk.**
**Dirû’x: direw, derew, dirû.**
**Mî dihet: didit, didet, eydat.**
**Fend: hûner, fen.**
**Gah: kat, dem, wext.**
**Berqa gulah: ciwanîya gulê, direwşanewey gul.**
**Xûrsend: şad, dilxûş, xûş’hal.**
**Rind: xweşik, ciwan, bedew.**

**Du ’haris**

Ez çûme ser girê dil, min dî li wê du ’haris
Her le’h’ze ’tov tiavêt ’ha’sid li dûbû ’haris

Ne er’zû ne semabû, belkî kû ew ’ema bû
Min gû çi ev ’ecêbin, me’hrûs û ’hers û ’haris

Nej av û ax û baye, nej agir û hewaye
Cewher kejê xir dibû, wek wî nebûn çu ’haris

’Alem ji wî nemaye, bê şibhû bê cewaye
Nûrî xû yêk ji waye, ev berzexê du ’haris

## Herf el-Cîm (pîta ”C”)

### Kiç

Çîye ev tac û ’e’saye, ke ji vê keç kuleha kiç
Hemîyan qe’sde bikin ’hurmetê ev padişeha kiç

Kû li çehxêde li ser deste, pîyalek ji meyê her
Çi kû şahidê ji qudsî bû nebînim guneha kiç

Guneha kiç kulehî, ’eynî ’îbadet ne bitin ew
Neçe bezmê kû sîyeh, ma li te ev bedrû meha kiç

Çi ’ecaib ji cebînê, di werit reş’heyê miskê
Li zucacê û lu’acê, ayetû’llah fe seha kiç

Hema ’alem me ku dî, ’sûretê re’hmanî dimînit
Bi ’heqîqet de nema, ’tel’eyê sîmîn cebeha kiç

Ji cemala e’hedîyet weh dibînim ku cuda bû
Zerre zerre heme ’alem ji nîgar û nîgeha kiç

Bi xû em fati’hê her babê xezanatî û cewrîn
Ku ’înayet ji mera hatîye der ’sub’hegeha kiç

Kesî vê padişehê ku ji çeşim lê bikehînit
Di kehînit ser û payê xû di çal û quleha kiç

Aşîyan girtîye ber kûh û dirixtê dilî yêkdil
Ava sîmûr’xê wî’salê bi yeqîn, qar û seha kiç

Kuçk û ’se’hra û cihan cumle bi awaz û sedayên
Ji sewab û ji ’îqabê pire ev ’erbedeha kiç

Tû bixûnî weh be bîn ’hakim û keybanot şihûd
Celwehê da biditê, padişeh û qîblegeha kiç

Be yeqîn ku ji du çeşmanê, ku xe’ta zûr nimakir
Here ber ’zillê kiçê, pakî dibînî bedeha kiç

Enbîya girtîye rahek weh diçît xef li derê wan
Ev kiça pinceh hizar salî ’xelet nîne reha kiç

Çîye ev kiç te digû Nûrî heye te’hqîq beyan jê
Tû bizan raste ’heqîqet be yeqîn, kej kuleha kiç

---

**’E’sa: gûpal, gûçan, kevezan.**
**Keç kuleh: keça kulavxwar.**
**Bezm: şahî, şadî, xûşî.**
**Bedir: heyva çardeh, mangî çwardeh.**
**’Tel’e: çarenûs.**
**Sîmîn: ciwan, zîwîn, zîvîn, bedew û sipî wek zîv.**
**Nîgar: wêne, şikil, sûret.**
**Nîgeh: sehkirin, timaşekirdin, temaşekirdin.**
**Cewr: xem û xefet.**
**Xezanat: gencîne, qase.**
**Sûb’hegah: elind, berê sipêdê, demî beyanî, berebeyan.**
**Aşîyan: mal, hêlane.**
**Dirixtê: dar û dirixt.**
**Sîmûri’x: teyrekê xeyalîye, melekî efsaneyîye.**
**Qar: wîqar, giran.**
**Seh: asan.**
**Kûçk: ber, berd.**
**Cumle: be giştî, bi tevayî.**

**’Erbed: hewar.**
**Tû bixûnî: tu biçrêt, tu gûranî bilê, bistirê (wesfa dengê wê dike kû çend xweşe).**
**Keybanot: jina te, kevanîya te, xêzanî tû.**
**Bebîn: bibî, bibye, bebî.**
**Şihûd: şahid.**
**Cilwe: xwenîşandan, bînîn.**
**Nima: der kir, aşkira kir, derî xist, aşkiray kird.**
**’Zil: sîber, sêber, sîwan, sih.**
**Rah: rêk, rêga.**

**’Husna nimayî**

Bi wê ’husna nimayî der şibhê dac
Cebîna mûşriq ’ebîra şibî ’ac

Ji Nûrî ’husnê dîdarê beyan bit
Cemalê bê celal û keis û mî’irac

**’Husna nimayî: ciwanî nîşandan, ciwanî timîşandan.**
**’Ac: îskî didanî Fîl, beşêke li dem û diyanî Fîl zûr be qîmete.**

*Piştî vê helbesta çar rêzî ya Şêx Nûreddînê Birîfkanî, Şêx Memdû’hê Birîfkanî di destxeta xweda ne gûtîye (wellahû ey’zen), ku tê mana ”hêşta hene”, wekû herdem li pêşîya helbestek nû nivîsandîye, lê me dît ku herdu helbest ne yekin, belkî jêk cudane, lewra me jêk veqetandin.*
*Perça duduyê eva ye*:

**Xelatê qurbê**

Mîya şeş salî qismet kir li rindan herdu isfîdac
Xelatê qurbê yêk libsî ji telbîsê di istîdrac

Bi bed’halî û ’safî ’halê Nûrî cur’eyek nûşî
Benagah mayê sekran her demê der sûretê ’xînac

**Mîya: mîyan, li naw, lem.**
**Isfîdac: (sifîd: sipî).**
**Benagah: le nakaw.**
**Telbîs: tiştên nerast di qalibê rast da nîşandan.**
**Di istîdrac: alîkarîya şeytana, yarmetî cindûke.**
**Xînac: deqdan, xal kutandin, weşim**

## Herf el-Mîm (pîta ”M”)

### Min dî ji ’xeflet

Min dî ji ’xeflet hate min, destek hilîna ez birim
Daname ser çerxek sivik, çerxê ji xû bêhûş kirim

Her se’itû gavû rojû şev, gurgur ji wê çerxê diçit
Axir ji wê çerxê giran, dengê evê j’tirsa mirim(**1**)

Mêrek li ser çerxê hebû, miskîn dida ber kêr bira
Canê me da ber niştera, hem kêr bira ker ker kirim

Xadim li nik mîrê mezin, hefta û heşta zêdene(**2**)
Hindî hilatim ez birim, girtim li nik ’ha’zir kirim

’Ha’zir kirim wê sa’etê, hisparte min barek mezin(**3**)
Min qet nebû taqet bi wî karî, dijê na ’sebirim

Hem cût li min hispar tibû, pêxas li ser şûka birim
Gêra li ser şûka belê, ’sebrê li ser qet nagirim

Ta jan û ’zerba xûn ji min, ra’het neda min yêk demê
Ra’het neda min yêk demê, teşbîhê çerxa daîrim

Têhnîme avê naditê, birsîme zadî naditê
Zêde ji ber wê ze’hmetê, ew rengî min kerker kirim

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 144

Gêre li ser şûka b'me kir, min herdu pê lê bûn siqet
'Zerbek li min da wê demê, {în der qefa} ez na'zirim

Min gû re'him ve min bibe, în'saf û re'hmet ey reqîb
Wî gû re'him mera nîye, ez j'berî dil hişiktirim

Be'hra ji ber aşê sivik, carî d'gera û negiha
Girdab û pêla dame ber, mewca ji bû be'hrê birim

Weqtê bi 'sed 'hîleû 'hewal, jê çûme der min dil nema•
Xû êşek di min kir 'seda, dexsî ji dengê nîrnîrim•

Axir nizanim dê çikim, dehrê mûnafiq hû dikit•
Dehrê belayê ewwelim, sê'sed hizar qîn'tar hene•

Barek li min wî bar kirî, sê'sed hizar qîntar hene
Qed ew reqîb nabête xû, ez qed neşêmê hilgirim

Nûrî mirada xû dikit, ha'zir di weqtê fûr'setê
Gava reqîb 'aciz dibê, ez wê demê êy qadirim

**Nişter: cûrek xencerêye.**
**Kerker: parçe parçe, tîke tîke.**
**Siparte min: sipardin, dayî be min, daf min, dav min.**
**Şûk: çûk.**
**În der qefa: eve li paşîyê, eme le piştewe.**
**Çerxa daîr: çerxa gerok, çerxî gerdan ke degerê.**
**Na'zir: mebest li vir "çavê min lêye", çawim lêye.**
**Girdab: girdav, gerînek, xûlanewe.**
**Dehr: dinya.**
**Qîntar: cûrekê kêşana tiştî ye, awayêke le wezin.**

(**1**)Şêx Memdû'hî li jêr peyva "axir" nivîsandibû "ahek" û li hember nivîsandibû (nûsxe).

(**2**)Şêx Memdû'hî li hember peyva "zêdene" nivîsandîye "zêde bûn" û li hember nivîsandîye (nûsxe).

(**3**)Şêx Memdû'hî li cihê peyva "barek" nivîsandibû "karek" û li hember peyva "barek" nivîsandibû (nûsxe).

•Ev çar sitêrên, ku me rêz kirîne, ev rêzên helbestê di nav dîwana Şêx Memdû'hî da tunebûn, me di destxetek din da dîtîye û li vir zêde kirîye.

**Xudawend**

Xudawenda bi sirra 'hukum 'hai mîm
Xudawenda b'lu'tûf 'herif 'tai yai mîm

Bikî Nûrî û nûna mûn'hezif jê (*)
Wekî zennûnê hem der daîrê mîm

---

**Xûdawend: Xwedê, Xûda, Xudê, Xûwa.**

**'Tai: "'Teha" navek ji navên pê'xember Mu'hemmedîye.**

**Hai mîm: destpêka sûreteka qur`anê ye.**

**Mîm: Mu'hemmed pê'xember.**

**Zennûn: pêxember Zennûn e.**

**Daîrê mîm: devê hûtê ku pêxember Yûnis daqurtand.**

(*) Mebest ji vê rêzê dibe peyva "wera": min bi nûra xwe bisoje.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 146

**Herf el-Nûn (pîta ”N”)**

**Mirada qelbî**

Dê mirada qelbî sûjî vî demî ’ha’sil kitin
Hîmmeta baxûyî tinasî ’arifê wa’sil kitin

Ewwelû axir jehir maye di dil da hate pêş
Wek me tavê meq’sedî kû kewazê kamil kitin

Qu’tbû ’xewsû şahû merdan, ’arifê her ûmmetî
Her me dî vê le’h’zeyê wî der heyvê daxil kitin

Kaf hai yai ’eyn ’sad ey wa’hidî yêkta bide
’Hîf’zê ’hai mîm her ji min dê lejjeyê zaîl kitin

Ismê e’i’zem her tûyî e’llahî ey e’llahî ey
Sermedê quddûs dê cer’han li dil xûş ’hel kitin

Ey kesê kes nîne jê perist miradê yêk demî
Dil bi vê nu’tqa te dê nu’tqa xû wek zengil kitin

Dest û payê dijminî ’xemder bi destê ’heq perist
Bê ser û pa û dil û can û mil û çingil kitin

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 147

Her bi payê ’heq çi tin, ew qet nizanit kîve çû
’Enferî me’hbûbê dil, dê weh ji payê şil kitin

Şibhetî xergûşê gûvê, her di kûnca ’uzletê
Dilbera hevdil mûwafiq, hadirî dê sil kitin

Sînê bismillah re’hîmê re’hmetê ’hayê ’helîm
Sîneyê pir ’xem bi dîdarê cih û menzil kitin

Xasme ’hîna şahidek ’ha’zir bibit cenîneyê
Me’zherî ’husna cela, qe’za sîyeh sîlsîl kitin

Dê qesem kim ez bi nûnû, pes be law’hû hem qelem
Her cîya Nûrî bixwazît hadirî ’ha’sil kitin

---

**Perist: peristin, sitayîşkirdin, xûşwîstin, birwapêbûn.**
**Xergûş: kivrîşk, kerwîşk, kêvrûşk.**
**Pes: piştra, dûwayî.**

**Herf el-Hai (pîta ”E”)**

**Dilo rabe**

Dilo rabe, bike karî, bişû desta li merdarî
Meke kislanû vî carî, dest hilîne b’ke isyare

B’ke ixtîyar li dinyaê, wekî Ademû ’Hewayê
Yeqîn tûj d’çîye fenaê, li paş dibî şermuzare

Li paş dikî gelek şerm e, mirin ’heqqe dête ser me
Evrû bazara te germe, bes bike bey’û bazare

Bes bike bey’an û şîra, tu terk bike mal û kura
Wekî merdê ’sa’hib sera, wekî alê di ixtîyare

Wekî alan û e’s’haba, tu kêm bike xurd û xaba
Bes bike zewqû şeraba, guh mede nefsa keffare

Nefsê tûyê bê kar kirî, pir sûç û gunehkar kirî
Ji mewlaî şermuzar kirî, gelek ’eybe, gelek ’are

Gelek ’eybe tu her hûkî, hemû şûla b’dilê xûkî
Tu dê xûlî b’serê xû kî, ev çi kesbe, ev çi kare

Ev çi kesbe te hilgirtî, ’hubba dinyayê tu girtî
Cem’e dikî kirt û pirtî, ji enwa’ê di emwale

Cem’a malî nef’e nîne, tu qenc bizane b’yeqîne
Xîlaf û şik qet tê nîne, bi qewlê ehlê ebrare

Bi qewlê nebîû îmama, zikrê Xudê ’sûb’hû şama
Lazim l’ser xa’sû ’ama, bi kîtabû bi guftare

Dilû bûçî tu nizanî, nefsa şirîka şey'tanî
Hem neyare l'gel xudanî, wekî gurganû 'heftyare

Wekî gurgê li nav berxa, wekî 'teyrê li ser ferxa
Daim dikit dewr û çerxa, şev û roja, mehû sare

Şev û roja tu 'xafil bî, li ser fe'ila di ba'til bî
Bi dûrî pîrê kamil bî, bi çend salayî paş mare

Tûyê rûwînî çi sewdayî, 'talibê malê dinyayî
Tarikê emrê xudayî, ey rûreşê gunehkare

Ey rûreşê bê'hed gelek, wek 'ebdê bê nanû nimek
Bû wî fikir, hatî felek, 'umir te çû bi xisare

'Umir te çû tûbe ne kir, te pê zanî 'emel ne kir
Qet j'gunneha te bes ne kir, te ne fikre te ne ware

Tu dê kengî keyû 'emel, tu bes bike 'tûlil emel
Gehişte te mirinû ecel, tu dê kengî keyû kare

Tu dê kengî keyû karî, daim bikî girî û zarî
Mekanê te qebrê 'tarî, te ne bange, ne hewar e

Te çi bang û hewar nîne, daim dikî girî û şîne
Meded ya nebî Nûrîne, li ber te bang û heware

---

**Al: taîfe.**
**Xurd: xwarin, xwardin.**
**Xab: nivistin, razan, xewtin.**

•Xwendevanên hêja, ev helbesta rabûrî, ya ku serê wê bi (Dilo rabe bike karî) destpê dike, me wekû orîcînala destxeta Şêx Memdû'hê Birîfkanî nivîsand. Lê eynî vê helbestê me di destxetek din da bi vî awayî jî dît, lewra me pêwîstî dît, ku em wê jî çap bikin.

**Dilo rabe**

Dilo rabe, bike kare bişû desta li maldare
Neke kislanû yêk care, dest hilîne b'ke ixtîyare

B'ke ixtîyarê li dinyaê, wekû Ademû 'Hewayê
Yeqîn tûj çîye fenayê, lew paş dibî şermizare

Lew paş dikî gelek şerm e, mirin 'heqqe tête ser me
Evrû bazara te germe, tu bes b'ke bey'û bazare

Tu bes bike bey'û şîra, tu terk bike mal û kura
Wekî merdê 'sa'hib sera, wekî alanû exyare

Wekî alan û e's'haba, tu terk bike xurd û xaba
Bes bikin zewqû şeraba, guh nedin nefsa keffare

Bêje nefsê tu rawiste, nexû qewî ya sermest e
Li bû 'hîlan ya serheste, ew kafire, 'seya hare

Nef'sê tûyê hîlak birî, pir sîçû gunehkar kirî
Li mewlay şermizar kirî, gelek şerm e, gelek 'are

Gelek şerme tu her hûkî, hemî şûla b'dilê xûkî
Dê tu axê b'serê xû kî, ev çi kesbe, ev çi kare

Ev çi kesbe te hilgirtî, viyana dinyayê tu girtî
Cemi'i dikî kirt û pirtî, bese 'imrê te êvare

Cem'a malî fayde nîne, tu qenc bizane b'yeqîne
Qet xîlafû şik tê nîne, bi qewlê ehlê ebrare

B'qewlê nebîyê îmame, zikrê Xudê 'sûb'hû şame
Lazime l'ser xa'sû 'ame, bi kîtabû bi guftare

Dilo ger tu nefî zakir, bi îzayê nebî 'Sabir
Li pêş mewlayî d'bî xasir, cezayê te agirû nare

Dilo bûçî wê nizanî, nefsa şirîka şey'tanî
Neyarî di gel însanî, her wekî gurgû 'heftyare

Wekî gurgê li nav berxa, wekî 'teyrê li ser ferxa
Daim dikit dewr û çerxa, şev û roj û meh û sale

Şev û roja di 'xafil bû, li ser fe'ilê di ba'til bû
Bi dûrî şêxê kamil bû, bi çend salî di hejmare

Tûyî dînê bê sewdayî, 'talibê malê dinyayî
Tarikê emrê mewlayî, rûsîyahû gunehkare

Gunehkarî bê'hed gelek, 'ebdekê bê nanû nimek
Bûte xirab gerya felek, 'imrê te çû bi xisare

'Imrê te çû tûbe ne kir, li dinyaê te bes ne kir
Te bes zanîû 'emel ne kir, 'heta kengî ...... hişyare

'Heta kengî ey bed'emel, teyê kirye 'tûlil emel
Gehişte te mirinû ecel, tu dê kengî keye kare

Tu dê kengî keye 'îbret, bila bes bit bey'û şîret
Te ne kesbe, te ne 'xîret, te ne 'ehde ne qerare

Tu guh b'gre vê gûtinê, ji bîr nekey qebrîû mirinê
Daim her Quran xwandinê, bû qulûba xûş 'sefare

.......çî .....zikrê ....., ji bû ehlê musilmane
Jengî dibit ji qelbane, bi qewlê ehlê ebrare

Bi qewlê e'llahû e'hed, fayde nadit mal û weled,
Tu terk bike buxlû 'hesed, bizane ew çi xisare

Dilo bûçî nakey karî, daim bikey girî û zarî
Mekanê te qebrê 'tarî, te ne bangeû ne heware

Te çi bangû hewar nîne, mekanê te zêrzemîne
Meded ya nebî Nûrî ne, me ber te bang û heware

Meded ya Ebal Qasim tûyî sul'tan, tûyî 'hakim
Ezê 'a'sî temennakim, tûy şefî'ê gunehkaran

Meded ya 'xewsê Geylanî, tu şehbazî û 'sul'tanî
Tû b'halê me 'a'siyan zanî, der wextê 'tengû dijware

**Ey malikê her 'alemê**

Ey malikê her 'alemê, dinya hemî mûlkê teye
Yêkser hilîne j'vê 'xemê, lu'tfa te her kafî meye

Ewwel tûyî dê her hebî, kes nîne teşbîhê te bî
Ya reb tu 'xeffarê me bî, hîvî li dergahê teye

Dê her hebî em dê mirîn, dinya û 'erşê mermerîn
Milyaket û mûlkê berîn, wan tirs û lerz û sucdeye

Zikrê Xudê tesbî'h didev, çi xûş diçûn ev roj û şev
Ji heybeta baxî(*)bi xef, 'halê li wan ev rengîye

Mewcê di be'hra qulzemê, cûşa li narê cehnemê
Qed nîne ra'het yek demê, bê ra'het û bê seknîye

J'milyaket û pê'xemberan, geda û mîr û serweran
Ew padişahê mehteran, mirinû fena vêra heye

Vê lewlebê vêkra birin, ew multeqay qebrî kirin
Ma ew nizanin dê mirin, mulkê dinê bê faydeye

Pê'xemberan ew zanîye, ji dil Xudê xû nasîye
'Işqa dinê vêra nîye, dil ba şemal û şem'eye

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 154

Dapîreqora hû çepel, dinya ewa xware bi zexel
Gû nebît ev renge mesel, hilnegirin ew qe’hpeye

Ew qe’hpeye telbîse ew, xware xisîse pîse ew
’Heyfe kû bênamûse ew, ne ji babetê rengê meye

Ew çûn û wan ’halek hebû, îman û ’ta’et zêde bû
Wan ber li dergahê te bû, ’husn û ’emel wan bû teye

Hindî kû wan xidmet dikir, roj û şeva ’ta’ed dikir
Şukraneyê nî’imet dikir, jêra keramet şehdeye

Jêra ne’îm û cennetin, î’hsan û lu’tf û mînnetin
Asanî ew bê ze’hmetin, her yek li dunya şehneye

Baxî kirin ’sa’hib kerem, rûspî hemû pir mu’hterem
Rûyê zemîn ba’xê îrem, jêra xelat û behreye

Jê hilnegirtin lezzetek, jê çûne der çûst û çelek
Bextê me vê dewrê gelek, cewr û cefa têra heye

Em axirî dûrîne lew, baxî li me girtin celew
Nefsê dime hespêt qelew, kêmbû ji bû wan tûşîye

Em mayne ’heyrî dê çi bît, yan dê giranî her hebît
Belkû ji ber f’ila me bît, rizq û ’te’am qetlazîye

Ya reb tu çêkey ’hakima, da ew fenaken ’zalima
Tûpê bidey me ’alima, da çê bibin pê ’ammîye

’Ammî kû ew rê d’berzene, ev ’hakimêt şehzadene
Cewr û cefa vêra hene, ev kulbe lew jê çêbîye

Kulb û giranî zêde bû, rizqê yetîman berze bû
Şîn û girî bêfayde bû, min gût qîyamet rabîye

Hinda digirtin kûh û deşt, rabû ji nav seyran û geşt
Nanê cehî l'wan bû behişt, lakînne dinya girtîye

Ev renge bû Mûsil zemîn, hem qel'e û Zaxû çinîn
Akre û 'Umadî çen diçîn, sê sal temam hû rengîye

Kulîyê zerû kulîyê belek, 'iqlîmê dagirtin gelek
Vajî li me gerya felek, kê ev giranî dîtîye

Genim û cehê xû berze kir, pir dewletan hîmmet ne kir,
'Imbar û dexlê xû vekir, lakin çi însafek nîye

Xûmsa cehî çû deh ruba, dewletîyan tê kir tebah
Ned'gû feqîra merheba, qe'h'tî dilê wan girtîye

Herçê kû dewletmende ew, derkê dilî şeşbende ew
Dinya li nik govende ew, axiret ji bîr wan çûîye

Nedihate bîr fikra feqîr, miskîn û bed'hal û esîr
Qed rojekê nethate bîr dewrê me hû rabûrîye

Dewrê me û vê ze'hmetê keftîne be'hra mi'hnetê
Paşî nizan çib ser me tê, çibkim hemî 'hukimê teye

Çibkim xuda 'hukmê xû kir, bereket j'erdî berze kir
Bê re'hmîyê ev renge kir, cumle li nik me çêbîye

Hindî me bê în'saf kirin, 'zulm û te'ida ze'hif kirin
Şûlên di bed pêşçav kirin, fikra me qelbê 'tarîye

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 156

Fikra me dilreş bû gelek, herdu l’me şahid bû melek
Firyad ji wan çûne felek, meşqî ji wan bednamîye

Bednamîye xe’tê reşe, karê me ’zulm û qerqeşe
’Halê li wan pir naxûşe, ka’xez qewî reş ’tarîye

Axir zeman hû reng diçît, qenc di wêda li nik diçît
Pûrr mi’hnet û dil’teng diçît, lewra kû hem serkînîye

Dûr bû ji min dewrê resûl, kaşû nema da bête hûl
Dînê mûnewwar bû melûl, pakan cihê xû zanîye

Hindî kû pak û ’sali’hin, rast û emîn û na’si’hin
Ew vî zemanî d’bê ru’hin, rengê ximûlê girtîye

Bê qedir û qîmet mane ew, dinya ji bû zindane ew
Xelwet mekanê wane ew, Mi’sir û ’Îraq û Şamîye

Ebdal û qu’tib xelwekêşe, ’eyşê li wan pir naxûşe
Dewrê bela bextê reşe, be’hra bela tê keftîye

Em keftine be’hra dinê, naête ber axiftinê
Her yêk bi xû maye b’tinê, bê giftûgû û bê ruye

Ma em nizanin dê webit, şûla guneh j’rengê mebit
Kerba Xudê jî l’pêş mebit, ev kulbe hêj kêmahîye

Kulb û giranî qetil û şer, dagirtîne jê be’hr û ber
Kirmanc û tirka serbiser, cewr û cefa têra bûye

Baran û re’hma xaliqî, kêm bû ji fisqa fasiqî
Zad û zewadê raziqî, kêm kêm ji bû nazil bûye

Ez lew dibêjim qî'seyê, însan û xelqê Mekkeyê
Xwar têne ehlê cadeyê, dinya hemî hûsanîye

Hûsanî rabûrî cihan, Be'xdad cihê qu'tbê zeman
Hem meskenê pê'xemberan, ew Mû'sila nûranîye

Ev Şam û 'Urfa û 'Heleb, ev rûm û ev tirk û 'ereb
Tirka negûtî ma sebeb, fi'ila te bû 'zahir bûye

Teşbîhê qewmê Lo'tî man, naête gûtin j'zaliman
Bê 'hed kirin ya reb eman, ew şehweta şey'tanîye

**Bax: ba'x.**
**Cûş: kelandin, kûlanin.**
**Geda: feqîr, siwalker, derûzî, deryûze.**
**Serwer: gewre, mezin.**
**Mehter: rêzdar, mezin, gewre.**
**Başemal: bayê şemalê, bay şemal.**
**Şem'e: mûmik, şemalk, mûm.**
**Dapîra qûr: Mebest li vir "dinya"ye.**
**Çepel: pîs, napak.**
**Qe'hpe: sûzanî, ûrûspî.**
**Rûyê zemîn: ser zewî.**
**Ba'xê îrem: ba'xê biheşt.**
**Çûst û çelek: gurc û gûl, aza, zîrek, çeleng.**
**Cewr û cefa: sitem, zûrdarî, bêwefayî, xem û xefet.**
**Cilwe: xû derxistin, bînîn, dîtin.**
**Celew: pêşgirtin, sedgirtin, mani'ibûn.**
**Qetlazî: giranî, qat û qirî, xela.**
**Kulb: xela, giranî.**
**Kûh: çiya, şax, çêw.**
**Iqlîm: herêm.**

**Tebah: tîyaçûn, neman.**
**Qe'h't: qat û qirrî, dilreqî.**
**Dewletmend: dewlemend, zengîn.**
**Bed'hal: 'halxirab.**
**Cumle: bedese, be kûmel.**
**Firyad: hawar û gazî, dad û bêdad.**
**Meşqî: rahênan.**
**Bednamî: bednawî, xirabî.**
**Melûl: melîl, mat, xembar, 'xembar.**
**Xûmûl: bêhêzî, xamil.**
**Xelwekêş: kesê kû diçe xelwetxanê û di nav tenêbûnê da dimîne.**
**Giftûgû: raz û nîyaz.**
**Qetil: kuştin.**
**Ma sebeb: çiye sebeb, hûy çiye.**

(*) Di destnivîsek din da peyva baxî bi xef bi vî awayî hatîye nivîsandin: baxoy bi xef.

## Ehlê Mû'sil

Herçê kû ehlê Mû'silin, er 'alimin, er cahilin
B'hîle û 'hewala t'kamilin, mîzan û bey'ê keylîye

Keyla Xudê b'şeri'ê şerîf, tedfîq kirin bê'hed xefîf
Firyad ji Kirmancê ze'îf, ya reb çi şehrek 'zulmîye

Miskîn rezê xû çê dikit, qûtê 'eyalî pêyda dikit
Barê kerê xû bar dikit, hajûte rê pir te'hlîye

Er fêqîye, er tûtine, hindî bi destî keftine
Kirmanc dibêt besî mine, qûtê biçûkan kafîye

Zadê 'eyalî kar dikit, barê kerê xû bar dikit
Qe'sda cihê bazar dikit, Mû'sil kû meq'sûda wîye

'Hîna geha şehrê mezin, beqqal ewêt şaşik mezin
Qewmê dirû'x ev 'hîlezin, şûla ewan telbîsîye

Weqtê si'harê roj ke hat, nazil kirin sûqê gû hat
Peyda kirin têda civat, gûtî werinê Kirmancîye

Çingal kû havête cihal, kêşa bi 'sed 'hîle û 'hewal
Talan kirin 'sa'hib 'eyal, Kirmanc nizanît ev çîye

Nîvek dizî barê feqîr, xewfa Xudê nedihate bîr
Çûbû ji behrê zemherîr, ew cehnema pir pêtîye

Weqtê kû ehlê Mû'silê, hûreng cema bûn 'hîlelê
Îsal bi navê meqtelê, pir fîtnîye bednavîye •

’Terîq bizanin me’xribe, şey’tan ji bû xû ’sa’hibe
Evrû li dinya mertebe, şehrê mezin wa’sil bûye

Bê’hed ji yêk kuştin gelek, şey’tan di nav gerya çelek
Cemi’iû cema’et û melek, wan çi li bajêrî nîye

Havête yêk ’top û tiveng, bê’hed kirin wan qetil û ceng
Rûmîne ew yanî fireng, sê meh temam hûrengîye

Kuştin gelek ferzend û jin, her rojekê çil jê mirin
Dergeh li yêk wêran kirin, bê’hed ’hesar û xanîye

Xanî jiberka mûxilin, maqû’xa hûreng mûşkilin
Fîcara ehlê Mû’silin, wi’llah ne ew însanîye

Ev renge bû xû kir cedel, lewra kû xelkê bed’emel
Zêde ji te’irîfê mesel, fikra qîyamet bûnîye

Fikra Xudê wan çû ji bîr, Ye’hya Beg ser wan bû emîr
Kuştin tiwan tikir neşbîr, ev reng ceza b’ser hatîye

Paşa ji bû wan melkemût, can û dilê wan jê disût
Jêra dexil weqtê firût, şehrê mezin lew birsîye

Wî dexl û ’xele kêm kirin, ’inbar ji xûra wî birin
Lew çend li kûlana mirin, ’xurbet li wî bajêrîye

Paşa bi xû beqale lê, lew ’halekê bed’hale lê
Ew ’hakimê deccale lê, kulbê dilê wî girtîye

Qarûn ’sîfet ’sa’hib ’teme’i (mîn kullî ’sinfîn îz ceme’i)
(Fî kullî şeyiîn masteme’i) îlla ji xûra anîye

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 161

Ew ’hakimê qanûn ’sifet, nebû ji wan desta veket
Da ’zalima çak berzeket, ev ’hîkmeta îlahîye

(Ha’za cezaûl ’zalimîn ya eyûhel qewmûl emîn)
(Ha’za cezaûl mûznibîn) tiştek bi destê kes nîye

**Keyl: destûr.**
**Bey’i: firûtin, firûştin.**
**Tedfîq: mebest li vir ”destûrê Xwedê tînine xwarê û ji bû bercewendîyên xwe cê be cê dikin”.**
**Firyad: hawar.**
**Qût: nan, xwardemenî.**
**Dirû’x: direw, derew, dirû.**
**’Hîlezin: fêlbaz, ’hîleker, firt û fêl.**
**Telbîs: destbir, qûlbir.**
**Civat: civîn.**
**Cihal: cewal, gînî, gûnî, gînîk, telîs.**
**Xewf: tirs.**
**Meqtel: cihê kuştin.**
**Bednavî: bednawî, xirabî.**
**Ferzend: zarûk, minal, ewlad.**
**’Hesar: ’hewşe, perjîn.**
**Mûxil: mûxilk, bêjing, bêjîng, hêlik.**
**Melkemût: Izraîl, (melekil mewt).**
**’Xelle: genim û ce, genim û cû.**
**’Xûrbet: ’xerîbayetî, ’ezadarî, mat, tazî.**
**Qarûn ’sîfet: wek qarûn, zûr dewlemend.**
**’Teme’i: teme’ikar, çikûz, qels.**
**Qanûn ’sîfet: xawen qanûn, wek qanûn.**

•Şêx Memdû’hê Birîfkanî di destxeta xweda li jêr peyva ”me’xribe” ev tarîxe nivîsandîye: 1242 hicrî, ku tê mena ev dastan di vê salê da çê bûye û ev helbest pê hatîye nivîsîn. herwiha bû zanîn ev helbesta bi navê ”Ehlê Mû’sil” her berdewamîya helbesta ku bi navê ”Ey malikê her ’alemê” ye. Û dîsan heta dawîya helbesta ”Beyta kulî” jî di destxeta Şêx Memdû’hî û Mehemmed Selîm Çelkî jî da yek helbest e.

**Beyta kulî**

J'we bas bikim be'hsê kulî, ev 'eskerê têk sinsilî
Qu't kir gîya belgê çilî, çi melkemûtê rizqîye

Tabûrî bestin şibhê Rûm, tebar li ser yek bûne kûm
Bi şeş meha girtîne 'zûm, er'zê Xudê 'zûma wîye

'Zûma wîye kûh û cebel, kulîzerû kulîyê de'xel
Dexl û gîya û rez di gel, 'heta berhê da çûîye

Pembû û tûtin qu't kirin, serê dixû vêra birin
Rizqanîya j'tirsa mirin, darê birî d'gel xwarîye

El'hemdûlîllah û şukur, mêwa rezî b'rizqê me kir
Kulî beşek xwerin nekir, bîstan û mêwa dêmîye

Genim û ceh û hem nîsk û nûk, herçî kû nû hatî bû cûd
'Hetta rehê xwarin sivik, dexlê gehîştî maîye

Xîvet vedan kulîzere, sûb'han ji şahê ekbere
Deşt û cebel têk 'eskere, er'zê Xudê dagirtîye

'Erdê Xudê dagirt û hat, rabû ji necdê kir xebat
'Heta tijî bû jê welat, zer bûn zevî û kanîye

Rûbar û kanî jê mehîn, bê'hed ji xû bêzar kirîn
Em qed nizanin kîve çîn, ev întîqama barîye

'Heta kû xerzê xû kirin, cût cût û kit kit jê mirin
Hadir di er'zîda birin, kilkî dixû bê hestîye

Er’zê qewî wek asinî, kilka ji rengê gasinî
Roj hat û dexlê xû çinî, nêzîkî wextê xerzîye

Rabû wekî mêşa reşe, paşî dû roja yê beşe
Sê roja ew ’xaret geşe, pê pêyî makê cûîye

Manendeyê mêşane ew, serê dixû kêşane ew
Hemîya ji ber êşane ew, dinya ji ber bê keyfîye

Gût ’eskerê barîme ez, bû ’a’sîyan hatîme ez
Wi’llah bi emrê wîme ez, bes kin ji dunya darîye

Weqtê mûrîd hatî mûrad, hatîne em qewmê cerad,
Ehlê fesadê yêk nezad, tûbe bikin re’hmanîye

Çil roj û şev bûrîne lê, kulî zerik cemîya welê
Mêwa rezî ’heyfa melê, te d’gût şewat lê hatîye

Fêqî û gîya û belgê dişîn, bîstan û ba’xêt xemrevîn
Sûtîne bîstan û çinîn, da def’ekin vî qewmîye

Xwarin hijîr û sêv û xûx, belgê hinarêt şeng û şûx
Nalî j’me tên ’sed ax û ûx, kanê çinîn û şînîye

Hêj weqte bû kulî zerik, hat ’eskerê kulî beşik
Kulîyê berê kêm bû li nik, ’sed car eve hindî wîye

Wê hat ji şerqî bê ’eded, ew ’eskerê hûy bê meded
Firyad ji nik şahê ebed, da ew belav kit cûndîye

Da ew belav kit ’eskerî, hîmmet li nik pê’xemberî
Dagirtîye kûh û berî, dinya hemî sîha wîye

’Ha’sil ji bûldanê ’hişik, ev ’eskerê kulî beşik
Xwarin hemî meznû kiçik, hişkar û gar û wehmîye

Wê kefte nêva bêdera, xanî û kuçkû pencera
Naçît bi ’zerbêt xencera, xwarin nivîn û hirîye

Min gût çira hatî kulik, ’hetta te wergêra felek
’Sed kes ji te çûn derhelek, lazim ji ber naşûkrîye

Wî gûte min lew hatime, ma yêk ji we nî’alime
Da fambikit ’halê mine, ev jehremare bû çîye

Gû em bixûyn jehrê jehr, bûna bikarêt bêbehr
Zewqa linik wî bû jehr, naxûş bikit jehra wîye

Zewqa linik naxûş b’kitin, dinya li nik wî reş bitin
Hişyar û bes pê hişbitin, dinya meta’ê bû çîye

Gû em jibû we ’îbretîn, bûrhan û rahê cennetîn
Bû ’a’sîyan pir ze’hmetîn, waberve ’uqbayê nîye

(Darûl ’xurûr)a sa’hire, bes pîreqûrê hilgire
Hilgir bixû ya bakire, bû kê ciwan û cindîye

Zadê bi jehr û sar û bar, dûrbit jite ew jehremar
Kes tê edanakit qerar, babî jibû te hiştîye

Ev reng kulî da min cewab, gû em liser ’teb’ê dewab
Ma tu nizanî malxirab, ev ’eskerê mej’bû çîye

Hindî dinê barê te bît, barê giran dê l’ser te bît
Daim dê ev karê te bît, dê her bivî ’halî bîye

Geh dê giranî bît lite, ’xembarî canîbît lite
Rûbar û kanî bît lite, axir zûha û hişkîye

Gû em hemî cûndê bela, ger aqil û şêx û mela
Da xû nekin pê mubtela, îman delîla eqlîye

’Aqil dikit hizrê dikwîr, mirnê jixû nakit ji bîr
Mûste’xriqê fikra dihwîr herdem digel me’ibûdîye

Dêl’me beyan bit xêr û şer, nîne çu qencî cezr û ’zer
Tiştek ji wan nabit mefer, faydê cîhanê fanîye

Faydê cîhanê têkhele, me’xşûşe lew pê ’hasile
Ba ’zulmeta nûra dile, lew dil ji wê bê hîvîye

Ez dê çi lêkim lezzetê, ez qenc dibînim jehretê
Dajê cudakim şehwetê, lewra ku jehra marîye

Jehra di nav zadê şirîn, însan gelek em dê mirîn
Em jê ewê qet narevîn, lakin jinû pê zanîye

Pêzanîye mesmûme ew, çib’kim ne ya me’ilûme ew
Ev lezzeta meşiûme ew, emma belê dûmahîye

’Xafil nizanîtin xeber, ’hettaku nazilbitin qebir
Perde ji ber çava vekir, ’hîlê dinê ’zahir bûye

Ez dê çikim ’halê li min, hewar ji min ’zahir bitin
Kes pê nizanin mêr û jin, min çi biserda hatîye

Ez dê çikim vê we’hdetê, qebrê giran û ’zulmetê
Dîsa ji ber vê ze’hmetê, gurzêt giran û qebrîye

Şiklê ’ebûsanî direş, çeşmê dişîn û pir digeş
Nazil li ser qebrê me xûş, hatin bi emrê rebbîye

Dêkin ji min pisyarekê, her ’sub’hû her êvarekê
Dêhêne ser min carekê, ’hetta temam bit ’heftîye

Pirsê ji îmanê dikin, geh geh ji mîzanê dikin
Dîsa ji Quranê dikin, da kifş bitin lê qencîye

Ey ’xafilê bisîyarê mest, ’hîna ji dinyayê verest
Dînê mûnewwer çû ji dest, îrû meqam der qebrîye

Ew menzîla hû nabikar, pir tê hene dûpişk û mar
Em dê t’qebrî da keyn qerar, ’hetta kû bêtin yadîye

Xûzîya kesê rast û durust, şibhetî bûkê lê nivişt
Kes nîne hişyar kit bi dest, îllah kû xûştivîyê wêye

J’ew baş dû menzildî hene, ew herdu melcayê mene
(Darûl ne’îm)ê dûjene, dûj û be’hişta baqîye

Hîvî dikim ez bêmefer, ew cenneta şîrîn ne’zer
Ferman ji barî bête ser, bêjît mekanê Nûrîye

Nûrî jite hîvî dikit, qe’sda dilî ’safî dikit
Cih cenneta baqî dikit, çinkî keremkarê weye

Wi’llah me pir ’i’syan kirin, ’zahir hinek penhan kirin
Hîvî ji re’hmanî kirin, re’hmê bidit vî ’ebdîye

Lu’tfê û re’hmû ne’sretê, ’hîf’zê û baxê cennetê
Dûr kit jime nefsanetê, kafîme ’hîf’za kafîye

Ya reb penahê min tûyî, hem mîr û şahê min tûyî
Hem şehrezayê min tûyî, j'me dûr bibit şey'tanîye

Hîvî ji mewlayê 'semed, 'ebdê feqîrê bê meded
Daxil bikî darê ebed, cennet meqamê ewlîye

Sê'sed hizar hem bê 'hisab, bê 'hed selam û hem sewab
J'min da 'heta (yawmel mîab), ber Mû's'tefa û hevrîye

Bê'hed 'selat û hem selam, j'min da 'heta yawmûlme-
qam
Ber 'Ehmed û qewmê kîram, e's'hab û al û qewmîye

Hindî hebit dinya dewam, bê 'hed 'selat, bê 'hed selam
Ber zatê 'Taha û îmam, her çar emînêt dînîye

Ev qi'se min jî lew dikir, da her kesê 'sa'hib fikir
Baxuy vebîrbêt be şukur, her ew muste'heq şukrîye

Daxwar livê cadê neçin, çendî li dinyayê hebin
Da kû selîm tê bimirin, bê fitneû û 'safî jêye(**1**)

Nûrî beyan kir mesele, der hicra nebî kamile
Elif û du'sed û hem çile, belkî du sal wî bûrîye(**2**)

Tarîx bizanin me'xrîbe, ev sale qe'h't û mehrîye(**3**)
Dinya ne her yêk mertebe, her salekê karê dîye.

**Sinsilî: peyta peyta, rêz li dû rêz, pey hev, dû hev.**
**Melkemût: Izraîl, (melekil mewt).**
**Tabûr: stûn, tîm, mefreze, grûp.**
**Kûh û cebel: Çiya û şax.**
**Mêwa dêmî: mêwî dêmî (dêmî: pêwîstî bi avê tune).**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÎÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 168

Şahê ekber: Xwedê mezin, ’hakimê mezin, Xûway gewre.
Mehîn: amîyan, mehandin.
Întîqam: tûlvekirin, tûle.
Hadir: yêkser, di gavê da.
Kilk: qelem.
Gasin: amîrê kû cûtî pê dikin.
’Xaret: talan.
Manend: wek, wekû, mîna.
Cerad: kûlî.
Nezad: nebû, peya nebû, peyda nebû.
Def’e: ’îlac.
Bê’edet: bê hejmar, bê ’hisab, bê ejmar, le radeber.
Bêder: aşkira, aşkera.
Rah: rêk, rêge, rêga.
Pîreqûr: mebest li vir ”dinya” ye.
Bakir: taze, dest lê nedayî, dest pê neketî, dest lê nediraw.
Edanakit: cê be cê nakit, dirûstî nakat.
’Tebi’i: arezû.
Mûbitela: tûşbûn, dûçar.
Di kwîr: di kûr.
Di hwîr: di hûr, ciwan.
Fanî: neman, le nawçûn, mirin.
Mefer: rizgar.
Me’xşûş: ’eybdar.
Mesmûm: dermankirî, derman xwardkiraw (sem: jehr).
Gurz: gûpal, (dareke, serê wê xire û bismar têdane ji bû şerî bi kar tê).
Çeşm: çav, çaw.
Geh geh: car car, carna.
Bisyar: zûr, gelek, pir (bisyarê mest: bê ’eqil, gelek

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 169

**mest).**

**Ferman: destûr, emir.**

**Barî: Xwedê, Xuda, Xwea.**

**Penhan: bi dizî, şardinewe, nihênî, veşartî.**

**Nefsanet: mebest li vir ”xweperistî” ye.**

**Penah: Harîkarê min, kûmekî min, yarmetî derî min.**

**Şehzade: ’hakim.**

**Sewab: çake.**

**Hevrî: hawrêkanî, e’s’hebekan.**

**Al: malbat.**

**Ba xoy vebîrbêt: bizanît, bû xûy lebîrbêt, ba xûy lebîrbêt.**

**Me’xrîb: êvar, êware, me`xrib.**

**Qe’hi’t: qat û qirî, giranî, xela.**

(1) Şêx Memdû’hî li jûr peyva ”tê bimirin” nîşanek danîbû û li perawêza rûpelê, li jêr ’eynî nîşanê nivîsandibû ”û taze bin”.

(2) Şêx Memdû’hê Birîfkanî li hember vê rêzê ev tarîxe nivîsandîye: 1242 hicrî.

(3) Şêx Memdû’hê Birîfkanî li hember vê rêzê cedwelek çêkirîye û di nav da ev jimara tarîxa rabûrî şirovekirîye, ku çawa peyva ”me’xrîbe” bi jimartina ebcedî dibe 1242 hicrî.

| M | ’X | R | B | |
|---|---|---|---|---|
| 2 | 100 | 1000 | 40 | |
| | | | | **1242 hicrî** |

Xwendevanên hêja, wekî me berî niha destnîşan kiribû, ku ev helbesta bi navê ”Ey malikê her ’alemê” ’heya vê rêza dawî ”Dinya ne her yêk mertebe, her salekê karê dîye” yek helbest e, hem di destxeta Şêx Memdû’hê Birîfkanî da û hem jî di destxeta Mehemmed Selîm Çilkî jî da, lê me ji hev veqetandin, ji ber kû ev dastane ya bi pir şêwe ye, demekê li ser ehlê Mû’sil û demekê li ser talanên kûlîya li ser Kurdistanê û me xwast dîyar bikin kû ev helbest giş yek helbeste ji bû parêstina tarîxa vê dastanê, ya ku li rêza berîya dûmahîyê nîşan kirî.

**Dermanê me•**

Ya reb hewar 'sed car hewar, perwane qed nagirî qerar
E'llah tuyî dermanê me, e'llah tuyî dermanê me

'Sed car hewaran dê kemê, ya agedarê 'alemê
Derman bikey vê 'alemê, e'llah tuyî dermanê me

Elem çîye? mu'hîbete, derman 'sebirû sekînete
E'llah bikey bi qismete, e'llah tuyî dermanê me

Eger 'hekîm 'Îsa bêtin, Lûqman ji qebra rabitin
Derdê me derman nabitin, e'llah tuyî dermanê me

Eger 'hekîmê Lûqmane, Dawûd ligel Suleymane
Nizanin min çi kûvane, e'llah tuyî dermanê me

Kûvana min Mu'hemmede, li bû roja qîyamete
Bû min bikit şefa'ete, e'llah tuyî dermanê me

Şefa'eta wî hîvîye, ber dergahê îlahîye
Bû feqîrê Birîfkîye, e'llah tuyî dermanê me

**Perwane: nimnimûk, minminîk, pelatîng, pepûle, pelpelatînk.**

•Ev helbesta Şêx Nûreddînê Birîfkanî di destxeta Şêx Memdû'hê Birîfkanî da tunebû, me ji destxetek din da dîtîye û nivîsîye.

**Beyta sekeratê** (*)

Qebrê b'tinê çi 'îbrete
Ru'h kêşan çendan ze'hmete
Ew her wekû qîyamete

'Hal û e'hwalit zanîte
Ecel ku hat, dê mirîte
Qîyamet wê l'me rabîte

Ew weqtê ku têtin ecel
Rengû 'sûret dibin têkhel
Lêkve dibin hêstî û wesel

Di fermane şahê celîl
Tên çil melek zû bi te'icîl
Ji bû ru'ha 'ebdê zelîl

Deh l'ser pîya, deh l'ser deste
Ç'nexûşekê reng sermeste
Ru'hê t'kêşin libin hêste

Deh l'ser sînge, deh l'ser 'ezman
Ç'nexûşekê çendî giran
Ru'hê t'kêşin li bin tiblan

'Hetta îna cerg û hinav
Vêk dikevin 'êrq û xînav
Lê nema çi reng û bizav

Ru'h kû kêşa 'hetta hinav
Lê peyda bûn 'êrq û xînav
Lê namînin 'herekû bizav

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 172

Wekî dilê wî d'givêşin
Cerg û hinav lêt herişin
Fikrû xeyal lêt şewişin

Ji ze'hmetê dil ker dibin
Rûndik ji çavan der dibin
Reng û 'sûret lê zer dibin

Çi ze'hmete, çi cefaye
Ru'h digehîte milaye
Ew derdekê bê daweye

Ew derdekê bê dermane
Ew ru'ha şîrîn gîyane
Ew teqdîra yê re'hmane

Teqdîra (malîkel mulke)
Dilê 'z'eîf pur 'xem dike
Ru'ha wî nabit sivike

Ew derdekê bê 'tebîbe
Ew qalibê ru'h qerîbe
Nalî jê diçin 'xerîbe

Ew qalibê ru'h çi sûke
Çend nisaxe, çend nicûde
Dinalît her wekî 'ûde

Dinalît û çi dilgîre
Vê dikevît 'hîre 'hîre
D'bêjît hewar l'me ixsîre

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 173

Çi ’ebdêkî bê awaze
Nesaxêkî bê daxaze
Çava diket ser evraze

Ru’h ji dilî fari’x bûye
Di singîda daxil bûye
Çi ze’hmete, nexûş bûye

Çi heybete, çi ’xew’xaye
Ru’h ji dilî bû cûdaye
Di singîda bû cemaye

Ru’h hilbûrî ji dest û mila
Jêra îna cerg û dila
Di singîda ru’h wa’sila

Ru’h kû ji singî hilbûrî
Ji ’halê xû da fikirî
Hêve wêve ew ’heyirî

Herdû çavan ku vetkete
Çi ’xew’xaye, çi heybete
Raste mirin qîyamete

Çi ’halekê cefakêşe
Çi ze’hmete b’jan û êşe
’Seyê le’în tête pêşe

Çi ’halekê nexûşkare
Çi bêntenge, çi dijware
Çi dilsûje, çi bêçare

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 174

Çi bê taqet, ’hal û bale
Xêr û şerran tête pale
Şey’tan tînê ava zelale

Têne nik melekê ’sewabê
Hem tên melekên ’ezabê
Ew d’gel dêkin ’hisabê

Ew şey’tanê bi le’inetê
Hindî bibînit derfetê
Da şûrbek avê bidetê

Jarû ’ebdû sergerdanû
Dijmin hemî lê cemyanû
’He’zretîye yê re’hmanû

Şey’tan dibêt ’ebd dê b’ke
Herçî dibêm tu qebûlke
Tu avê li devê xû b’ke

Vê dibêjit el xennase
Bawer bike min binase
Dê l’ze’hmetê bî xelase

Herê ’ebdê keftîye davê
Dê tu vexû şûrbek avê
Wê re’het bî her vê gavê

Ew derdekê pir cefaye
Avê vexû dê b’şîfaye
J’îlletê dibî ’effaye

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 175

Vêra dibêt vê, le'îne
Avê vexû çend şirîne
Belê îman bi min bîne

Eger avê wer negirî
Ji îmanê nabit berî
Ji şey'tanî dê bit berî

Eger teqdîr bû beyane
Avê vexût hêj b'giyane
Dê lê xilas bit îmane

Iblîs vêra hevdek dibit
Ru'h li ger bê reng reng dibit
Hindî kû têt bênteng dibit

Ew melekên hat berayê
Ru'h kêşa 'hetta gewrîyê
Dê hêlin bû dûmahîyê

Her nav 'ezabêda d'mînit
'Izraîl zû dilezînit
Ru'hê j'gewrîyê der tînit

Bi fermane, bê nîyaze
Qalib dimînit bê awaze
Çavan dikit ser evraze

Ru'h kû xaric bû tevave
Rawesta mal li hindave
Lê rêk dibin herdû çave

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 176

Ru’h ji qalibî d’firîte
Ru’h qalibî her d’bînîte
Herdûkan qewî êkdû d’vête

Herdû liyêkdû di fikrin
Di’acizin, te’heyûrin
Bi ’halê xû dixebirin

Qalib dibêt ya ru’hayê
Xûzîya wekî l’ser dinyayê
Peşîmanî b’kêr me nayê

Hindî d’saxîn nehişyarîn
Wekî d’mrîn di hişyarîn
Peşîmanîn, şermizarîn

Ew mêvanê seferîye
Mal û ’eyal hêlaîye
Çîte mala qedîmîye

’Xessal wekû ew tête nik
Cilkan li ber dikit nazik
Gazî dikit sivik sivik

Dibêt ya ’xessal qewî xêre
Tû biwî key yê xebîre
Hêdî hêdî min wergêre

Nekey l’min ze’hmet û janê
Birîndarim ji êşanê
J’ber ’Izraîl ru’h kêşanê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 177

D’bêt ya ’xessal melezîne
Qalib bi derd û birîne
Kifn û çavan l’min neşidîne

Tû her wekî bav û kuran
L’min veşêre ’eyb û sirran
Şermê dikim j’yar û biran

Wekû kifnî derwar dikin
Ser û çavan settar dikin
Çar e’trafan hewar dikin

D’bêt ya ’xessal b’ke minetê
Çavan negire vê sa’etê
Da bifukrim di kulfetê

Sefera min qewî dîre
’Eyalê min gelek hîre
Da jê bixwazim destîre

Da bibînim vê sa’etê
Jê bixwazim ez hîmmetê
Dwîre roja qîyametê

Wekî dana li nav dara
Gazî d’kete xizm û yara
Min sefera l’çar dîyara

Ew kû l’dara kir siware
Gazî d’ket bang û heware
Ka zûka min bînin xware

Çûme mala axê û gilîn
Li xû fikrin ya xasirîn
’Îbret b’grin ya ’xafilîn

Vê dinyayê ez revandim
’Hetta bi mirnê gihandim
Vê dinyayê ez ’xarandim

Ey ’ebdê wê sergerdane
Malxirab û peşîmane
Çûye mala ’taristane

Çi ’halekê nexûşkare
Çi qebrekê dukan sare
Tijî kirmû mişkû mare

Tijî mar û mişk û mûre
Çar dîware qewî kûre
Qîyamet jê hêşta dûre

Gelek kûre, gelek ’tenge
Pir ’ezabe, b’denge, denge
Her e’llah d’zanit çi renge

Çi ’halekê bê mefere
Dûşeka wî tûz û gire
Balîfa wî hişke bere

Marê semûm her digezît
Ji heybetê her dê lerzît
Çû der nîne pêve b’bezît

’Ebdê sefer kir ji dinê
Di qebrîda mabû b’tenê
Vêca ’halê xû dît b’tenê

Çi ’halekê dukan qebre
Bê ’emel û zad û debre
D’bêt hewar min nahêt ’sebre

Bi fermanê şahê ’Îzze
Tên dû melek zû bi leze
Di ’erdîda diçin geze

Ew tên wekî baw û hûre
L’bin ’erdî d’kin qireqire
Di sergêrin wekî şêre

Dişekirin bê fesale
Gurzêt agir wan li bale
J’ebdî d’xwazin çend sûale

Xaliq êke, her nemire
Tên nekîr û hem mûnkire
J’gurzêd wan diçit agire

Bêje îmamê te kîye?
Hem bêje Xudê te kîye?
Pê’xemberê te jî kîye?

Bêje ka dînê te çîye?
Hem qîbleta te ya kêye?
Xwîşk û birayê te kîye?

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:58 PM Page 180

Sûal dikin van hemîyane
Li hemû cinnû însane
Lazim fe'sî'h b'kin beyane

Her çî 'ebdê kû 'sali'h bit
Ziman li wîî dê fe'sî'h bit
Cewaba wî wê melî'h bit

Dibêjit (e'llahû rebî, we Mu'hemmed Nebîyî, wel îslam û dînî)

(Wel Quranû îmamî, wel ke'ibetû qîbletî, wel muimînûne îxwanî)

(Wel muimînatû exewatî) ya'inî xwîşkû birayêt min (Ehlû'llah)

(Eşhedû en la îllahe îlla'llah, we eşhedû enne Mu'hemmeden resûlû'llah)

Ferman dikit pê xaliqe
Rastî j'ebdê min 'sadiqe
Xûş mêvane, ew laîqe

Ya melekîn xidmet bikin
Mêvanê min 'îzzet bikin
Kifnê caran 'hurmet bikin

Mêvanê min xidmet bikin
Qebrek fireh î'hsan bikin
Tijî gul û rey'han bikin

Misk û 'enber 'hu'zûr bikin
Bêhnên dixûş bixûr bikin
Qebrê wî tejî nûr bikin